


Dewlet û Mîrgehên Kurdî

di Serdemên Naverast û Nû da

Orta ve Yeni Çağ'da
Kürt Devletleri ve Beylikleri



Komeka Vekoleran
Editörlü Kitap



Senterê Zaxo Bo Vekolînên Kurdî

Pertûk	Dewlet û Mîrgehên Kurdî li Serdemên Naverast û Nû da
Ji nivîsîna	Komeka Vekoleran
Berg	Bergê Dûyê 2023
Berg û serpersîtîya dîzaynê	Warhêl 'Ebdulbaqî Remzîya Xelîl Ehmed Şîrîn Xerîb Salih Îman 'Ebd Mehcub Rêzan qasm hisên Sara Feyaz Teyîb Diljîn mistefa yusif Hêja faxir se'îd Fatma Xald 'Ezîz
Desteka dîzaynê	
Rêkxer	Pale 'îsa
ISBN	978-9922-661-15-5
Jimara Sipardinê	D- \2344\23

Ev pertûke (dewlet û mîrgehên kurdî li serdemên naverast û nûda) komeka vekolînan bi xweve digrît, ku bo heftemîn konifransê navdewletîyê senterê zaxo bo vekolînên kurdî ya ser bi fekolîtiya zanistên mirovayeti li zankoya zaxo, li rojên 3 û 4ê gulana 2023ê hatîne pêşkêşkirin. Vekolînên gehîştîne konifransî ji layê lîjneya zanistîve hatîne hêlsengandin û vekolînên hejî bo belavkirinê hatîne destnîşankirin. Lîjneya zanistîya konifransî ji evan berêzên li xwarê pêkdihêt:

Prof.Dr. Hogir Tahir Tewfîq	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Serokê
Prof.Dr. 'Ebdulsalam Necmedîn 'Ebdullah	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Serokê senterê Zaxo bo vekolînên kurdî
Asst. Prof.Dr. Nizar Eyûb Hesên	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Serokê lîjneya zanistî
Prof.Dr. Xelîl 'Elî Murad	Zanîngeha Selaheddîn	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Prof.Dr. Husên Osman 'Ebdulrehman	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr. Diyar 'Ebdulkerîm Seîd	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Prof.Dr. Ferset Merî Îsmail	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Prof. Dr. Şewket Arif Mihemed	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Prof. Dr. Xizîr 'Ebas Mihemed	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Prof. Dr. Xetab Îsmail Ehmed	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Prof. Dr. Şerzad zekariya Mihemed	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr. Lulaf Mistefa Selîm	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr. Xesan Welîd Mistefa	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr. Faxir Hesên Yûsif	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr. Tariq Ahmid Şexo	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr.Osman Abdulkerim Omer	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr. Evin Mihemed Hesên	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr. Mihemed 'Ebdulqadir Husên	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr. Kameran Îbrahîm Xelîl	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Asst. Prof.Dr. Heyder Leşkerî	Zanîngeha Zaxo	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Dr. Ismail Şames	Zanîngeha 'Ellame Tabataî	Îran	Endam
Dr. Hêmin 'Umer Ehmed	Zanîngeha Soran	Herêma Kurdistanê/Iraq	Endam
Prof. Dr. Abdurrahman Acar	Zanîngeha Dîcleyê	Tirkîye	Endam
Asst. Prof.Dr. Sabri Ateş	Zanîngeha Southern Methodist	Tirkîye	Endam
Asst. Prof.Dr. Fatih Gencer	Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû	Tirkîye	Endam
Asst. Prof.Dr. Ercan Gümüş	Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû	Tirkîye	Endam
Asst. Prof.Dr. Ercan Çağlayan	Zanîngeha Mûş Alparslan	Tirkîye	Endam
Asst. Prof.Dr. Ömer Tokuş	Zanîngeha Bîngolê	Tirkîye	Endam
Asst. Prof.Dr. Metin Atmaca	Zanîngeha Zanistên Mirovayeti ya Enqere	Tirkîye	Endam
Asst. Prof.Dr. Fasih Dinç	Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû	Tirkîye	Endam
Asst. Prof.Dr. Yalçın Çakmak	Zanîngeha Münzûrê	Tirkîye	Enda
Dr. Ekrem Akman	Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû	Tirkîye	Enda
Dr. Nevzat Keleş	Zanîngeha Bîngolê	Tirkîye	Enda
Dr. Mehmet Rêzan Ekici	Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû	Tirkîye	Enda
Dr. Abdûlgani Kaçar	Zanîngeha Mêrdîn Artûqlû	Tirkîye	Enda

Dr. Yusuf Baluken	Zanîngeha Bozok a Yozgatê	Tirkîye	Enda
Dr. Sacha Alsancakli	Zanîngeha Inalco's Eurasian Studies	Tirkîye	Enda
Dr. Yaşar Kaplan	Zanîngeha Hakkârî	Tirkîye	Enda
Dr. Abdusselam Ertekin	Zanîngeha Dîcle	Tirkîye	Enda
Doktorant Cafer Açar		Tirkîye	Enda
Abdullah Demir	Zanîngeha Bîngolê	Tirkîye	Enda

P. H. D. Macid mihemed yunis	Serok	Zanîngeha Zaxo
D. Şureşvan 'adil	Endam	Zanîngeha Zaxo
D. Jîrwan se'îd	Endam	Zanîngeha Zaxo
P. H. D. Şivan qasim hesen	Endam	Zanîngeha Zaxo
P. H. D. Kawan xelîl 'sma'îl	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Cim'e mihemed qadir	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Warhêl 'sma'îl 'omer	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Karwan salih Weysî	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Hejar 'bidalle hisên	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Silîman şefîq	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. 'omer 'ebdulrehman 'omer	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Jêhat qadir hesen	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Wehîd n'met remezan	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Pale 'îsa	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Dlêr kmal	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Mihemed 'îsa	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Warhêl 'bdalbaqî kamil	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Cegerxuyn cemîl 'emîn	Endam	Zanîngeha Zaxo
M. Mihemed hacî hemîd	Endam	Zanîngeha Zaxo

Naverok

PÊŞGOTÎN	P.Dr. Hogir tahir tewfîq P.H. Dr. Nizar eyûb hesen	1
NIRXANDINEK DERHEQÊ CIHNEGIRTINA EŞÎRA MILAN DI ŞEREFNAME YÊ DE	Doç. Dr.Ercan GÜMÜŞ	5
PEYMANA HIKIMDARAN 1535 Peymana Qanûnî Siltan Silêman Digel Hakimên Kurd	Prof. Dr. Mehmet Rêzan Ekinci	17
XANEDANIYA CANPOLATAN Û DEWLET AVAKIRIN CERIBANDINA ELÎ PAŞAYÊ CANPOLATZADEYÎ	Eyüp kiran KîEyüp KîraEyüp Kîra	33
Li Kurdistanê Pêjna Tenzîmatê (Emînê Emaneta Me'denan Yûsûf Zîya Paşa û Terzê Rêveberîya Wî Wekî Numûne)	Dr. Öğr. Yaşar KAPLAN	55
NIRXANDINA SÊ BERHEMÊN ZIMANÎ YÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ JI ALÎYÊ ZIMANÎ VE	Doç. Dr. Mustafa Öztürk Dr. Mikail Bülbül	73
Kevneşopiya Mewlîdê Di Nav Kurdan De û Beşdariya Wan Di Edebiyat û Çanda Kurdî De (Bi MînakaKurdên Tirkiyeyê)	Doç. Dr. Halil Akçay	93
Eşîret di sîstema dewlet û mîrgehên kurdî de Eşîra Pencînarên We Mînak	Zeynelabidin Zinar	107
NIRXANDINEK DERBARÊ LÊXWEDÎBÛNA MÎRÊN KURDAN A DENG BÊJAN DI ÇARÇOVEYA PERGALA HÎMAYEKARÎYÊ (PATRONAJ) DA	Doç. Dr .Mustafa ASLAN	115
MENTEŞA OĞULLARININ MENŞEÎ MESELESİ	Doç. Dr. Kenan BOZKURT Doç. Dr. Şahin ŞİMŞEK	133
1071 ŞERÊ MELEZGIRT Û ROLA KURDAN	Abdulkerim BATMAZ	157
XI. Asrın İlk Yarısında El-Cibâl Bölgesinde Bir Aşîret: Cûrkân (Goran) Kürtleri	Dr. Arafat YAZ	173
Mervânîlerin İdarî Yapısı	Doç. Dr. ÖMER TOKUŞ	193
MERVANÎLER DÖNEMİNDE MEŞHUR MUHADDİSLER	Doc.dr.fikret ozcelik	215

Mervânîler’de Hadis İlimi	Doç. Dr. Abdulvasıf ERASLAN	235
SELÇUKLU ORDULARINDA KÜRT VARLIĞI	M.A. Medine KahramanKAHRAMAN	253
ŞİKÂRÎ’NİN KARAMAN-NÂMESİ’NİN 13 VE 14. YÜZYIL KÜRT TARİHİ YAZIMINA KATKILARI	Doç. Dr. Kenan BOZKURT	267
Kürt Mirliklerinde Statü, İdari Yapı ve Kurumlar Status	Dr. Öğr. Yakup AYKAÇ Güven Aytaç AYKAÇ	285
KÜRDİSTÂN TERİMİ VE 16. VE 17. YÜZYILDA KÜRT SANCAKLARININ İDARİ YAPISI	Abdullah Demir	311
Osmanlı-İran Sınırında Bir Serhad Mirliği: Bayezid Mirleri (1578-1800)	Doç.Dr.Hakan kaya	333
Kürt Mirlerinin Osmanlı Merkezi İktidarıyla Geliştirdiği İlişkileri Kuramsal Bir Çerçeve de Değerlendirmek (1514-1847)	Doç.Dr. Orhan Örs	349
OSMANLI KAYNAKLARINDA ZAZA SÜVEYDİ EMİRLİĞİ (1515-1853)	Doç. Dr.Ercan ÇAĞLAYAN	377
OSMANLI MODERNLEŞMESİNİN KÜRT BEYLİKLERİ ÜZERİNDEKİ SİYASİ VE İDARİ ETKİLERİ	Doç.Dr. Muzaffer BİMAY	395
BEHDİNÂN KÜRT EMİRLİĞİ DÖNEMİNDE YAPILAN MİMARİ ESERLER	Dr. Halil BATUR	419
19. Yüzyılın İlk Yarısında Osmanlı Devleti’nin Dersim Aşiretleriyle İlişkisi	Doç. Dr.Yalçın ÇAKMAK	437
Orta ve Yeni Çağ Kürt Devlet ve Beylikleri Medreselerinin Kürt Dili ve Edebiyatına Katkısı	Dr. Öğr. Gör. Nevzat EMİNOĞLU	447
Emirate of Muks and Its Surrounding in Terms of Historical, Scientific, and Literary Perspective	Dr. Öğr. Gör. Ömer Aytaç Aykaç Dr. Öğr. Gör. Zikrullah Aykaç	461

Li Kurdistanê Pêjna Tenzîmatê (Emînê Emaneta Me'denan Yûsûf Zîya Paşa û Terzê Rêveberîya Wî Wekî Numûne)

Dr. Öğr. Üyesi. Yaşar KAPLAN

Zanîngeha Hakkari- Fakûlteya Îlahîyatê- Beşa Dîroka Ayînan/ Turkiye

Kurte:

Di dîroka Dewleta Osmanî û kurdan da ragehandina Fermana Tenzîmatê werçerxeke gelek girîng e. Bi vê fermanê ve her çend desthelatdarîya sultanê hinek hatibe kêmkirin jî otorîteya hukmê merkezî li ser her kuncêkî dewletê hatîye sepandin. Mîrgehên kurdan pîranî bi şiklê hukûmet û yûrtlûq ocaqlîq bi dewletê ve hatibûn girêdan û di rêveberîya navxweyî da xudan selahîyeteke berfireh bûn. Di çarçova sepandina hukmê merkezî da mîrgehên kurdan yek bi yek hatin rakirin û deverên wan bi rê ve dibirin, bi hemî alîyan ve keftine bin destê rêveberîya merkezî. Lê belê pêvajoya cîbecîkirina hukmê merkezî bi şiklê sanahî û bi carekê pêk nehat. Mîrên kurdan li dijî vê çendê derkeftin û encama şer û pevçûnên giran ev pêvajo gehiştê encamê. Bizavên Dewleta Osmanî yê ji bo sepandina hukmê merkezî xudan paşxaneyê encama hinek guhorînên sîyasî, îdarî, aborî û civakî ye. Hêj di berî ragehandina Fermana Tenzîmatê bizavên derbarê sepandina hukmê merkezî bi şiklê dest pê kirine. Taybetî di serdemê Yûsûf Zîya Paşayê (m. 1817) rêveberê Emaneta Me'denê Humayûn da ku yek ji girîngtirîn dahata malî ya Dewleta Osmanî bû, li Bakûrê Kurdistanê dest bi sepandina hukmê merkezî û kêmkirina desthelatdarîya mîrên kurdan hatîye kirin. Yûsûf Paşa ji bilî rêveberîya Emaneta Me'denan a domdirêj, di eyaletên Kurdistanê Osmanî di nav da hatî dabêşkirin ên wekî Dîyarbekir, Erzerûm, Heleb û Bexdayê jî walîti kiribû û ev çende, derbarê ehwalê kurdan da bûbû egerê şarezabûna wî. Bizavên Yûsûf Paşa yê derbarê cîbecîkirina hukmê merkezî yê Kurdistanê bala sultanî kêşabû û ew hatibû teqdîrkirin û bi payeyên sedrezamî û sereskerî ve hatibû teltîfkirin. Di vê meqalê da bi berfirehî li ser bizavên Yûsûf Zîya Paşa yê derbarê sepandina hukmê merkezî li Kurdistanê yê di dawîya sedsala 18an û despêka sedsala 19an, terzê reveberî û desthelatdarîya wî ya berfireh, peywendîyên wî yê di gel kurdan, bikarînan hêza leşkerî li dijî kurdan û encamên polîtîkayên wî yê rê li ber cîbecîkirina Tenzîmatê sanahî kirî, bête rawestan. Armanca gotarê, berî Fermana Tenzîmatê, di çarçova rêveberîya Yûsûf Zîya Paşa da pêşkêşkirina wêneyekî giştî yê Bakûrê Kurdistanê an jî bakûrê Feratê ye.

Peyvên Sereke: *Yûsûf Zîya Paşa, Emaneta Me'denê Humayûn, Tenzîmat, Mîrgehên Kurdan, Hukmê Merkezî*

Destpêk:

Nîva sedsala 18an ya duyê û nîva sedsala 19an a yekê ji ber ku gelek guhorînên sîyasî û civakî encam dane hem di dîroka kurdan da hem jî di dîroka Osmanîyan da sefheyê gelek muhîm e. Guhorînên van sed salan di talîyê da bi rakirina mîrgehên kurdî yê ser bi Osmanî û sepandina hukmê merkezî li Kurdistanê ve emcam da. Her çend

derbarê pêvajoya rakirina mîrgehên kurdan û encamên wê da gelek xebat hatibine kirin jî derbarê paşxana van guhorînan xebatên hejî nehatine kirin. Divê bête zanîn ku ev guhorîn ji nişka ve çênebûne û paşxaneyêke tijî rûdan û çalakî heye. Taybetî rola Yûsûf Zîya Paşa û Emaneta Me'denên Humayûn a qismekî muhîm ê Bakûrê Kurdistanê vedigirt nehatîye vekolîn. Heke rola Yûsûf Zîya Paşa wekî şexs û rola Emaneta Me'denan wekî rêveberîyeke îdarî û malî baş nehête zanîn an jî berbanga Tenzîmatê bi rengekî zerdûzelal nehête raçavkirin di têgehiştina vê pêvajoyê da dê nuqsanî çêbît. Çunkî Muşîrîyên Sêwas, Dîyarbekir û Erzerûmê yên bi cîbecîkirina Tenzîmatê li Kurdistanê û rakirina mîrgehên kurdî ve mujîl bûyî, li ser bingehê Emaneta Me'denan û mîrasa Yûsûf Zîya Paşa hatine avakirin.

Emaneta Me'denan a Yûsûf Paşa nêzîkî bîst salan emînî û rêveberîya wê kirî di nav dahatên Dewleta Osmanî da cihekî taybet hebû. Yûsûf Zîya Paşa di dema emînîya xwe da hinek guhorînen îdarî êxistine rêveberîya vê emanetê û sînoren îdarî yên vê emanetê wekî pêgehek ji bo sepandina hukmê merkezî bi kar îna. Paşê ev terzê rêveberîya xwe di serdemê walîtî, wezîrî û sedrezamîya xwe da jî tetbîq kir. Bizavên Yûsûf Paşa yên ji alîyê dewletê ve encamên serkeftî bi dest êxistî bû egerê wê çendê ku bala sultanî bikêşît û dergêhên payeyên bilind ji bo wî vebin. Lewra bi desthelatdarîyeke berfireh û xurt ve piranîya Bakûrê Kurdistanê kefte destê wî da. Wî çî bi dilxweşkirin an jî pîrî caran bi çavtirsandin û çewisandinê ve bizava xurtkirina hukmê merkezî û wergirtina her cûre bacekê kir. Lê belê sererayî rola paşa ya girîng ew nebûye mijara vekolînen derbarê dîroka kurdan.

Derbarê jîyan, karmendî û tesorûfên Yûsûf Paşa da jêderê serekî pirtûka bi navê Zîyaname ya Îzzet Hesên Efendîyê Darendeyî nivîsî ye. Îzzet Efendî ji sala 1791ê wê ve wekî berdesk û kâtibê Yûsûf Paşa xebitîbû. Wî, pirtûka xwe di navbera salên 1803-1804ê da nivîsîye û tê da behsê emînîya Me'dena Humayûn, walîtî, sedrezamî, sereskerî û sefera Misrê ya Yûsûf Paşa diket. Di pirtûkê da bi berfirehî behsê rêveberîya paşa ya Kurdistanê, seferên wî yên leşkerî yên dijî kurdan û sefera Misrê tete kirin. Herwesa me di gelek cihan da ji arşîvên Osmanî sûd wergirt.

Emaneta Me'denên Humayûn:


Me'den, di nava dahatên xezîna dewleta Osmanî da samanekî serekî bû û wekî "warîdata cesîme" dihate binavkirin. Me'denên ji kanên me'denan dihatin derêxistin ji bo derbxanê (cihê darijtina pareyan), topxane, tersane (cihê çêkirina keştîyan) û cebexane (cihê çêkirina çek û teqemenîyên şerî) dihatin rêkirin û di wan deran da dihat bikarînan. Di sedsala 18 û 19an da dema Osmanî beramberî dewletên Ewropî bi paşvemana xwe hesîyayî pirtir giringî da vî biwarî. Kanên me'denan yên Erxênî û Kebanê yên di nava îdareya Eyaleta Dîyarbekrê berê hinek caran girêdayî muqata'aya¹ me'denî ya Gumîşxane û hinek caran jî wekî muqata'ayeke serbixwe ya girêdayî derbxanê dihate rêvebirin (Tızlak, 1991, p. 24) (Tızlak, 2000, p. 926). Di nîva dawîyê ya sedsala 18an da ji ber girîngîya van herdû me'denan, ev herdû me'den di bin banê yek rêveberîya serbixwe ya bi navê Emaneta Me'denên Humayûn (Meadin-i Hümayun Emaneti) hate rêkêxistin. Her çend wisa tete qebûlkirin ku ev îdare di 19î Adara 1775an hatibe avakirin jî (Tızlak, 1991, p. 26) li dû hinek belgeyan ev îdare berî hîngê di sala 1764ê da hatîye avakirin (Alanoğlu, 2017, p. 297). Di kanên Emaneta Me'denên Humayûn da me'denên wekî zêr, zîv, risas, sifir (paqir) û murdeseng dihatin derêxistin (Tızlak, 1991, pp. 197-221).

Fermana 19î Adara 1775ê ya derbarê avakirina Emaneta Me'denên Humayûn ya bo walîyên eyaletên Dîyarbêkrê û Sêwasê hatîye rêkirin, ji bo têgehiştina îdareya nû hatî avakirin, îfadeyên sêrincrakêş vedihewînît. Berî her tiştêkî me'denên Keban, Erxenî û yên ser bi wan ve wekî muqata'ayên mucsesem û mu'ezem hatine destnîşankirin. Di nivîsên demên cuda da hatîne nivîsîn da jî ev çende têtê dubarekirin û ew der wekî serekanîya beytulmal, xezîneyên xeybî yên dewletê, mezintirîn warîdat, metbexa kîmyayî û ûmûr-û muhîmme têtê danasîn (Tızlak, 1991, pp. 26-27). Wekî ji van îfadeyan dîyar dibît ev me'dene wekî yek ji girîngtirîn dahata dewletê têtê dîtîn. Ji ber girîngîya van me'denan, emaneta nû, bi nîzamateka cuda ve serejinû hatîye rêkêxistin û bi dana hinek payeyên nû ve îdareya wê hatîye serbixwekirin. Emaneta Me'denên Humayûn bûye xudanê "serbestîyet" û "ber vechê îstîqlalîyet"ê û erdên girêdayî ve emanetê jêrdestê îdareya eyaletên Dîyarbêkrê û Sêwasê hatine derêxistin. Êdî ev der ji alîyê emînê ve emanetê ve hate birêvebirin û rêvebirîna her karekî 'edlî, mulkî, aborî, leşkerî û sîyasî ve bû rêveberîyeke musteqîl (Tızlak, 1991, pp. 28-31). Ji bilî îdareya me'denan, te'yînkirina hakim, senceqbegî û voyvodayên² deverê, çareserkirina de'wayên şer'î, komkirina her cûre bacekê, pêkînanana asayîşê û her karekî dî ji alîyê emînên emanetê ve hate rêvebirin. Ya ji hemîyan muhimtir ewe ku Eyaleta Me'denên Humayûn şîya hêzên leşkerî ava biket û di demên pêdivî da wan bikarbînît (Tızlak, 1991, pp. 61-76) (Tızlak, 2000, pp. 930-934). Bi vî rengî Eyaleta Me'denên Humayûn ji şiklê rêveberîyeke aborî derkeft û wekî eyaleteke serbixwe lê hat. Senterê revebirîya Emaneta Me'denên Humayûn demeke dirêj Keban bû. Ji sala 1833yan wê ve bajarê Xarpêtê bû merkeza reveberîyê (Tızlak, 1991, p. 59).

Di destpêkê da piranîya deverên dikeftin nava îdareya Emaneta Me'denên Humayûn ji eyaleta Dîyarbêkrê hatibûn wergirtin. Lê belê bi borîna demê ra gelek deverên ser bi eyaletên Sêwas, Erzerûm û Maraşê jî li vê emanetê hatine zêdekirin. Emaneta Me'denan îro bi tamamî teqabulî bajarên Xarpêt (Elazığ), Meletîye, Bîngol (Çewlîg) û Dersîmê (Tuncelî) diket û herwesa evê emanetê bajarên wekî Semsûr, Erzîngan, Dîyarbêkir û Ruha jî qismen vedigirt. Di nava sînorên Eyaleta Me'denên Humayûn da ev kanên me'denan hebûn: Keban, Erxenî, Ûyûm (Darendê), Tewfîq (Şîro, Gerger, Kahta, Potûrge yên ser bi sencaqa Meletîyê), Elbîstan. Herwesa di nava sînorên emanetê da ev sencaq, qeza û lîwa hebûn: Erzîngan, Gurcanis (Refahîye), Kuruçay, Kemah, Exîn, Çarsencaq (Çemişgezak, Saqeman, Pertek, Mazgirt), 'Erebgîr, Palû, Keban, Ebu Tahîr, Erxenî, Çungûş, Çermîk, Gerger, Kahta, Hekîmxan, Gêlê (Egîl) û Sêwereg (Tızlak, 1991, pp. 33-49).

Rêveberîya Emaneta Me'denên Humayûn bi şiklekî musteqîl hebûna xwe heta sala 1836ê dewam kir. Di vê salê da bi avabûna Muşîreta Sêwasê ve Emaneta Me'denên Humayûn daxilî ve muşîrîyetê bû û serbixwebûna xwe (ber wechê îstîqlalîyet) wenda kir. Lê belê Muşîr Hafîz Mihemed Paşa ku bi rakirina mîrgehên kurdan ve dihête nasîn, bajarê Xarpêtê wekî merkeza muşîrîyê bi kar îna û li wê derê rûnişt. Dema sala 1839ê Muşîrîyeta Dîyarbêkrê hate avakirin û Emaneta Me'denan daxilî ve muşîrîyeta nû bû. Di sala 1845ê Fermana Tanzîmatê li Muşîrîyeta Dîyarbêkrê hate cîbecîkirin û hîngê Emaneta Me'denên Humayûn wekî senceqekê hate dîyarkirin. Ji bo vê sencaqê qaymeqamek û ji bo qezayên ser wê ve jî mudîr hatine te'yînkirin. Her çend di rêveberîya aborî da wekî berê serbixwe mabe jî ji alîyên dî ve serbixwebûna xwe wenda kir. Di heman salê da bi avakirina Eyaleta Xarpêtê ve Emaneta Me'denên Humayûn di gel Xarpêt, Sêwereg û Dêrsimê bû yek ji çar

senceqên vê eyaletê (Tızlak, 1991, pp. 77-85). Bi avakirina muşîrîyetan û cîbecîkirina Tenzîmatê ve Emaneta Me'denên Humayûn, ji bo binecîhkirina polîtîkayên merkezîbûnê û rakirina mîrgehên kurdan bû pêgehekî serekî û ev pêvajo ji wê derê hate rêvebirin.



Nexşe 1: Di sala 1825ê Emaneta Me'denên Humayûn (Tızlak, 1991, p. 54).

Di nava sînoren rêveberîya Emaneta Me'denên Humayûn da her çend piranî kurd (kurmanç û zaza) hebin jî herwesa rêjeyeke baş a tirk, ermen û suryanîyan jî hebû. Kurdên wê deverê ji sunnî û elewîyan pêk dihatin. Qismekî mezin ê Emaneta Me'denên Humayûn li ser erdnîgarîya mîrgeha Mirdêsî (Gêl, Palû û Çermîk) û mîrgeha Çemîşgezakê (Mazgird, Pertek, Saqeman û Dêrsim) hatibû avakirin. Di wê serdemê da Mîrgeha Mirdêsî statûya xwe ya hukûmetê (Gêl û Palû) û yurtluq-ocaqliqê (Çermîk) diparast. Lê belê Mîrgeha Çemîşgezakê di dawîya sedsala 17an da statûya xwe ya hukûmet û yurtluq ocaqliqê ji dest dabû û wekî muqata'ayan bi rêka voyvodan ve dihate rêvebirin (Ünal, 1991, p. 263). Beramberî vê çendê îdareya Osmanî li Dersîmê binecîh nebûbû. Wekî ji van agahîyan dîyar dibe qismekî muhim ê Bakûrê Kurdistanê di nava Emaneta Me'denên Humayûn da dima. Vê emanetê bi taybetîyên xwe yê îdarî ve, serkêşîya cîbecîkirina polîtîkaya merkezîkirinê kir û paşê sepandina hukmê merkezî hêdî hêdî sîrayetî derdora wê kir. Taybetî di dema emînê vê emanetê Yûsûf Zîya Paşa da bizavên cîbecîkirina merkezîyetê werareke baş girt. Dema ji bilî rêveberîya vê emanetê walîtiya Erzerûm û Dîyarbêkrê jî ji bo paşayê navborî hatîye tewcîhîkirin, hîngê hema hemî rêveberîya Bakûrê Kurdistanê kefte destê wî da û bi vî şiklî berî ragehandina Tenzîmatê meydan ji bo sepandina hukmê merkezî hatîye amadekirin. Ji bo têgehiştina vê pêvajoyê bi hûrgilî nasîna terzê siyaset û rêveberîya Yûsûf Zîya Paşa gelek girîng e.

Yûsûf Zîya Paşa:

Yûsûf Zîya Paşa, derdora 1750ê hatîye dinyayê. 'Eslê xwe gurgî ye û ji koleyên Hecî Mustafa Axayê Benî ye. Di zarokî û xortanîya xwe da perwerdeyeke baş dîtîye. Di dema walîtiya Ispanakçi Mustafa Paşa ya Erzerûmê da di gel maîyeta wî hatîye deverê. Di gel sermîyanê xwe çûye hecê û di rêka vegeerê da hatîye ve Stenbolê. Dema Çîl Mihemed Emîn Axa wekî emînê Keban û Erxanîyê hatîye te'yînkirin, ew jî bi karê muhurdarîyê di gel wî hatîye Kebanê (1779). Ev karê xwe di dema emînê nû Yegen Mihemed Axa da jî

berdewam kir. Ji bilî muhurdarîyê wekî karê serperiştîya hêzên leşkerî yê dijî kurdan da jî cih girt. Di sala 1781ê hate Stenbolê. Dema Yegen Mihemed Axa di sala 1784ê mirî ji ber şarezabûna wî ya deverê û karê me'denê bo Kebanê hate rêkirin û di sala 1786ê wekî emînê Emaneta Me'denê Humayûn hate te'yînkirin. Yûsûf Zîya Paşa di nava emsalên xwe da ji hemîyan zêdetir ev kare bi kirîye û di navbera salên 1785-1799 û 1807-1811ê da wekî emîn kar kir. Yûsûf Zîya Paşa, di dema emînîya xwe da di berfirehkirina kapasîteya kanan, peydakirina kanên nû, zêdekirina hilberîna me'denan, dabînkirina sotemenîyê û te'mînkirina asayîşa deverê ve bala sultanî kêşa. Ji ber van serkeftinan di gel emînîya emanetê, sencaqa Meletîyê bo hate tewcîhkirin. Paşê bi payeya wezîrîyê ve hatîye teltîfkirin (1792-1793) û bi rêzê ve walîtîya Eyaleta Dîyarbêkrê (1793-1794), Eyaleta Erzerûmê (1794-1798), Eyaleta Çildir (1796-1797), muhassalîya Canîk û dîsa walîtîya Eyaleta Qeremane (1797), Eyaleta Trabzonê (1797-1798) ji bo wî hatîye raspartin. Yûsûf Zîya Paşa cara pêşîyê di serdemê Sultan Selîmê IIyê (1798-1805) û cara duyê di serdemê Sultan Mehmûdê IIyê da (1809-1811) du caran sedrezamî kirîye. Taybetî ji ber terzê sîyaseta xwe ya caran tund û caran nerm şîya otorîteya dewletê li deverê ava bike û dahatên dewletê zedê bike. Vê çendê bala sultanî kêşa ser wî. Dema Dewleta Fransayê bi serkêşîya Napolyon Bonaparte welatê Misrê dagirkirî (1798), ji bo xelaskirina Misrê wekî Sedrazam û serokê hêzên Osmanî hate wezîfedarkirin. Di navbera salên 1798-1802yê da bi sefera Misrê ve meşxûl bû û bi rengekî serkeftî ve gerî Stenbolê. Di sala 1805ê xwe ji sedaretê vekêşa. Di sala 1806ê walîtîya Eyaleta Trabzon û Erzeromê, 1807ê walîtîya Eyaleta Bexda û Helebê bo hate raspartin. Di sala 1807 walîtîya Qersê û li dijî Rûsan sereskerîya şerqê kir. Di şerê Osmanî û Rûsan ê di sala 1809ê da dîsa wekî sadrazam û seresker hate te'yînkirin. Lê ji ber têkçûna Osmanîyan a di şerî da di sala 1811ê da ji wezîfê hate wergirtin. Herwesa di heman salê da ji emînîya Emaneta Me'denan jî hate wergirtin û li Rodosê hate bicihkirin. Di sala 1817ê da li girava Seqizê mir. Dema Paşa ji sedareta ewilî hatîye wergirtin ji ber ku mal û samanê wî li ser jina wî qeyd kirîbû, mal û samanê wî nehatibû musaderekirin. Lê belê dema jina wî di sala 1812ê da mirî serrafê wî Migirdîs hatîye gazî kirin û hemî mal û samanê wî hatîye tesbîtkirin û musaderekirin. (Erkutun, 2004, pp. 14-19) (Beydilli, 2013, pp. 34-36) (Sansar, 2019, pp. 10-109).

Yûsûf Zîya Paşa di gel emînîya Emaneta Me'denan wezîfeyên walîtî, wezîrî û sedrazamî pêkve kirîne. Lê belê karê wî yê serekî û 'eslî emînîya emanetê bû ku nêzîkî 19 salan ev kare kirîye. Ew di cara ewilî bi seferên leşkerî yê dijî kurdan ve hatîye nasîn (Erkutun, 2004, p. 106) û serkeftinên wî bala sultanî kêşane. Peydakirin û derêxistina me'denan û neqilkirina wan ya bi ewlehî, rê li ber wî vekirîye û wî jî ev çende ji bo firehkirina sînorên emanetê û zêdekirina îmtîyazên wê bi kar înye. Ev karê bi şiklekî dûr û dirêj pêkînayî derê wergirtina payeyên bilindtir bo wî vekirîye. Wî, di dema rêveberîya emanetê da unsîyetek di gel deverê peyda kirîye, di rêveberîyê da gelek şareza bûye û ev şarezayî bûye palder ku bi wezîfeyên mezintir ve bête teltîfkirin. Tecrûbeyê rêveberîya emanetê, li ser terzê sîyaseta û rêveberîya wî gelek te'sîr kirîye. Ew di vê pêvajoyê da bûye xudanê mantelîya karsazekî û karên dewletê bi vê têgehiştinê ve îdare kirîye. Karê xwe bi mentîqa ticarekî di çarçova hesab kar û zererê da hêlengandîye.

Terzê Reveberîya Yûsûf Zîya Paşa ya li Deverê:

Emaneta Me'denê Humayûn berî her tiştêkî ji bo hilberîna cewherên di kanên deverê hatibû avakirin. Li dû vê çendê hemî îmkanên deverên ser bi emanetê ji bo

pêkhatina vê çendê hatibûn seferberkirin. Di vê noqtê da divêt bête dîyarkirin ku ji bo Emaneta Me'denên Humayûn zehmetîya serekî hilberîna me'denan nebû. Arîşe û bargiranîya esasî dabînkirina sotemenîyê, bi şiklekî rêkûpêk neqilkirina vê sotemenîyê bo firinên me'denan û di pêkînanana van xizmetan da parastina ewlekarîyê bû. Emaneta Me'denên Humayûn ji bo rêvebirina van karan sîstemek avakiribû. Li dû vê sîstemê li ser deverên emanetê yên xudan daristan bi şiklekî 'eynî dabînkirina sotemenîyê (komir/rejî û qurmedaran) û li ser deverên emanetê yên bê daristan jî beramberî sotemenîyê wergirtina baceke neqdî hatibû sepandin. Mîrgehên wekî Palû, Gêlê û deverên wekî Çarsenceq, Kocaozî, Arxûwan, 'Erebgir, Akçadax û 'eşîretên wekî Zîve û Parçikan bi dabînkirin û neqilkirina komirê/rejîyê ve mukelef bûn. Deverên wekî Kemah, Kuruçay, Gurcanis, Exîn bi dabînkirin û neqilkirina qurmedaran ve mukellef bûn. Darên dihatin birîn li erdên dîyarkirî dihatine sotin û dikirin rejî. Ji ber birîna daristanan êdî darûbar kêmbûbûn û daristanên heyî li erdên dûr û asê mabûn. Komir û qurmedar piranî bi rêka kelek û beleman ve ji çem û rûbaran derbaz dikirin û digehandin Kebanê. Qeza Xarpêtê, senceqa Meletîyê, Dîwrîxî, qeza Çungûş, Çermîk, Sêwereg û hinek nahîye jî bi dana baceke neqdî ve mukellef bûn (Tızlak, 1991, pp. 278-303).

Wekî ji van agahîyan dîyar dibît tiştê ji bo Emaneta Me'denên Humayûn ji hemîyan muhimtir dabînkirin û neqilkirina sotemenîyê bû. Bi rêkûpêkî pêkhatina vî karî jî girêdayî parastina ewlekarîyê bû. Rêveberîya me'denan kurd wekî yek ji mezintirîn hokarên têkdana ewlekarîyê didîtin. Ji ber vê çendê hemî bizava Yûsûf Zîya Paşa li dor sepandina hukmê merkezi û nehêlana hêzên derveyî emînîyê dizivirî. Ev rewşe di nivîseka serê sala 1812ê bo Stenbolê hatîye rêkirin da bi eşkerayî dîyar dibît. Di vê nivîsê da tete dîyarkirin ku Me'denên Humayûn ên Keban û Erxenî warîdata mu'ezzem û ceybî humayûn e (berîka padîşahî ye). Divêt di her hal û her wextî da bi başî bête rêvebirin û ji xerabûn û zererê bête parastin. Li dû nivîsê hemî der û dorên me'dena navborî ji kurdan û eşqîyan pêk têt. Ji ber ku bi borîna demî ra erdên komir û qurmedar jê tene dabînkirin êdî dûr ketine, qûwet û nufûza karbidestên rêveberîya me'dena humayûn heke lawaz bibît, kurd û eşqîyayên firsetê digerin dê bibine rêgirê veguhastina komir û qurmedaran û herwesa dîyar e ku ji bo têkdana nîzama Me'denên Humayûn dê bizavê bikin. Di halê hazir cudakirina Yûsûf Zîya Paşa ya ji sedaretê li nav xelkê deverê belav bûye û heke dewlet bizavekê bo zêdekirina hêza nufûza emînê me'denê neke, ji hemî rexan ve hemî dê serê xwe rakin û meslehetê xerab bikin. Bi xwe di vê demê salê û serê meha adarê emînên me'denê ji sermayeya ber destê xwe pareyan belav dikin. Heke di vî zurûfî da îxtîlalek bête meydanê sermaye dê xusareteke mezin bibînît û hilberîna Me'dena Humayûn dê sektedar bibît. Divêt Me'dena Humayûn an dîsa jêdestê Yûsûf Paşa bît an jî ji bo yekî din bête îhalekirin. Heke emr û îrada senîye hebît divêt nehêt paşêxistin. Çi nebît ji bo pêknehatina îxtîlalekê heta yek tete te'yînkirin, bila bi destekî sivik rêveberîya Me'dena Humayûn wekaleten ji bo karmendê wê Ehmed Paşa bête tewcîhkirin (HAT. 565.27729). Wekî ji vê nivîsê dîyar dibît piştî Yûsûf Paşa ji sedaretê hatîye wergirtin da ku di rêvebirina me'denan da valahîyek peyda nebe, daxwaza emînekî nû tete kirin. Kurd wekî yek ji girîngtirîn egerê sektedarkirin û têkbirina dahata me'denê tene pênasekirin û herwesa em baş têdigihin ku Yûsûf Paşa di wextê xwe da li dijî vê çendê bizaveke xurt kirîye. Herwesa Yûsuf Paşa bi xwe jî di nivîseka xwe ya di sala 1809ê bo Stenbolê rêkirî da îşaretê didet vê çendê. Di nivîsa xwe ya derbarê tenkîlkirina kurdên Bêhisnî ya ser bi Meletîyê da wiha dibêjît: "Ji bilî wê çendê ku mîzaca wan (kurdan) meyîldarê îxtîlal û

fesadê ye, der û dorên me'dena humayûn tenê bi taîfeyên eşqîyayên kurdan ve girtîye û heke bi nîzamê ve nehêne girêdan an jî daxilî nîzamê nebin rêveberîya me'denan dê sektedar bibît" (TS.MA.e 898.15). Yûsûf Paşa di îfadeyên xwe da wekî piranîya rêveberên Osmanî ji bo kurdan peyva "şaqî" bi kar tîne. Wisa dîyar e ku kurdên derveyî hukmê merkezî an kurdên ku naxwazin bikevin li nav çerxa rêveberîya dewletê an jî kurdên ku ji bo ji destnedana serbixwetîya xwe bizavê dikin wekî "şaqî" têne binavkirin. Beramberî vê çendê kurdên bi her awayî hukmê merkezî qebûl dikin jî wekî "se'îd" têne pênasekirin.

Teserûfên Wî yên Îdarî:

Wekî li jorê hatîye îfadekirin Emaneta Me'denên Humayûn li ser esasê "serbestîyet" û "ber vechê îstîqlalîyet"ê hatibû rêkêxistin. Bi vê taybetîya xwe ve ew hem jêrdestê walîyên eyaletên cîran hatibû derêxistin hem jî di her cûre teserûfeke navxweyî da hatibû serbixwekirin. Lê dema di rêveberîya Yûsûf Zîya Paşa da hem payeya wezîrîyê bo wî hatîye danê û hem jî bi payeya walîyatîya eyaletên deverê yên wekî Dîyarbekir, Erzerûm, Çildir û Trabzonê ve jî hatîye wezîfedarkirin, hîngê reveberîya devereke berfireh bi carekê kefte destê wî da. Ji ber vê çendê me divêt teserûfên wî ên îdarî wekî yên navxweyî (Emaneta Me'denê) û yên derveyî (walîyatîya eyaletên cîran) dabeş bikin.

Di rêveberîya îdarî ya emanetê da cihêrengîya serekî di teserûfên derbarê mîrgehên kurdî yên wekî hukûmet û yurtlûq Ocaqlîqê da dîyar dibin. Hukûmetên Palû û Gêlê û senceqa Çermokê yên di nav Emaneta Me'denê da berê ji alîyê walîyên eyaletan ve dihatin rêvebirin. Li dû vê çendê mîratî bi qeydê heyat ji bo her mîrekî dihat terxankirin. Lê belê di sedsala 18an wê ve ev mîrgeh bi xizmeta me'denên Keban û Erxenîyê ve hatin girêdan û herwesa te'yîna mîrên wan jî kefte destê emînên me'denan. Êdî mîratî bi şertê pêkînanana xizmetên me'denê bo salekê hate tewcîh kirin. Ev guhorîne gelek girîng bû. Çunkî êdî van mîran îmtîyazên xwe ji dest dan û zêtedir tûşî mudaxeleyan bûn. Her çend van mîran bizav kiribe ku vê çendê qebûl nekin jî lê bi jêwergirtina statûya wan ya hukûmet û yurtlûq ocaqlîqê ve hatin tehdîdkirin. Ji ber vê çendê mecbur man vê nîzama nû qebûl bikin (Alanoğlu, 2017, pp. 305-306). Berpirsyarîya van mîran ya beramberî emînê me'denan dabînkirin û neqilkirina sotemenîyan, tedarîka amûretên pêdivî bo kelekên veguhastina komirê û parastina ewlekarîya veguhastinê bû. Her mîrê ev kare pêk ne'naba ji karî dihate dûr êxistin (Alanoğlu, 2017, p. 287). Yûsûf Zîya Paşa gelek caran êrîşên leşkerî birine li ser mîrên pêgirîyê bi emrên emanetê nekin. Nivîskarê Zîyanameyê her çend bi hûrgilî behs neke jî dîyar dike ku du caran hakimên Palû hatine te'dîbkirin û carekê jî bi top û muhîmatî ve leşker bo hakimê Gêlê hatîye sewqkirin. Herwesa kurdên Herdî, Zîve, Parçikan ve Sarimîşe hatine te'dîbkirin û axawatên Çarsencaqê sê caran hatine tenkîlkirin. (Erkutun, 2004, p. 142).

Derbarê teserûfên îdarî yên Yûsûf Zîya Paşa da numûneyeke herî balkêş wergirtina muteserîfîya Meletîyê ya ji destê Rîşwanzadeyan e. Rîşwanzadeyên serok 'eşîrên 'Êşîreta Rîşwan ji destpêka sedsala 17an were bi payeya paşatîyê ve hatibûn teltîfkirin û muteserîfîya senceqa Meletî û hinek caran jî bi walîtîyên eyaletên wekî Mereş, Edene û Sêwasê ve hatibûn wezîfedarkirin. Di serdemê Yûsûf Zîya Paşa dema li Şîro û Potûrgeya ser bi Kahtaya qeza senceqa Meletîyê kanên me'denan hatine dîtin. Di sala 1783yê muteserîfê Meletîyê Rîşwanzade Omer Paşa wekî mîremîranê Mereşê hate wezîfedarkirin. Meqseda vê teltîfê dûrkirina wî ji kanên me'denan yên di nav senceqa Meletîyê bû û Meletî ser bi Emaneta Me'denan ve hate girêdan. Omer Paşa di sala 1785ê dîsa bû muteserîfê Meletîyê lê belê muqata'ayên Rîşwanê bo Emaneta Me'denan hatine

tewcîhkirin (Söylemez, 2011, pp. 166-168). 'Eşîra Rîşwan ji Rîşwana xwecih ya li Hisn-i Mensûr û ji Rîşwana koçer pêk dihat. Emaneta Me'denan ji bo Rîşwana xwecih mutesellîmek û bo ya koçer jî axayek te'yîn kir û ji wan xwest ku bac bête komkirin. Lê belê Rîşwana xwecih dijî vê çendê derkeft û mutesellîmê xwe kuştin. Li ser vê çendê hem bo Rîşwana xwecih hem jî bo koçerên Rîşwanê ji Emaneta Me'denan leşker hate sewqkirin û mutesellîmekî bi hêz li wê derê hate danan. Yûsûf Zîya Paşa, Omer Paşa bi harîkarîyeke layiq nekirinê ve suçdar kir (Erkutun, 2004, pp. 111-113). Piştî demeke kurt bi mirina Omer Paşa ve (1791) delîve bo Yûsûf Zîya Paşa çêbû ku bi yekcarî senceqa Meletîyê bi ser emanetê ve girê bidet.

Dema Rîşwanzade Omer Paşa mirî neviyekî wî bi navê Ebdurehman ê şeş salî û birazayekî wî bi navê 'Elî hebûn. Li dû agahiyên Zîyanameyê 'Elî Beg berî ku ji alîyê dewletê ve bête wezîfedarkirin wî bi hizra ku ji qedîm senceqa Meletîye ya malbata wan e û ekber û erşedê malbatê jî ew e, li cihê mamê xwe rûniştîye. Herwesa ji bo qezayên Meletî, Gerger û Şîro mutesellîm rêkirine (Erkutun, 2004, p. 113). Yûsûf Zîya Paşa bi nivîsekê ve Stenbolê ji vê çendê agahdar dike û di nivîsa xwe da dibêje ku gelek deynên dewletê mane li ser Omer Paşa û ji bo wergirtina van deynan wî dest danaye li ser mîrata paşayî. Di nivîsê da têtê dîyarkirin ku Rîşwanzade, wî memleketî wekî milkê xwe teserûf dikin û pêncêka malê mîrî (dewletê) nadin û zulm û te'dayê li xelkê feqîr dikin. Ji ber ku kêr şola wan nahêt, nahêlin Me'dana Humayûn karê xwe bi rê ve bibet. Paşa, 'Elî Begê wekî mirovekî dîn û zalim dide nasîn û dixwaze ku ew der bi yekcarî bi ser emanetê ve bête girê dan (AE.SSLM.III. 273.15800). Lê belê ji Yûsûf Paşa hate xwestin ku heta 'Elî Beg têtê girtin û malê mîrî jê têtê standin divê nezane ku ew der jê hatine wergirtin. Piştî vê çendê Yûsûf Paşa bi zimanekî şîrîn nameyekê bo 'Elî Begê rêdike û tê da dibêje senceqa Meletî ji qedîm ya malbata Rîşwanzadeyan e. Belê divê hun bi meblexekî ve bêne vê derê (Kebanê) da bo we bête tewcîhkirin. Piştî ku 'Elî Beg bi zimanê şêrîn ve tînine Kebanê, wî digirin û hemî malê mîrî jê berhev dikin. Bi vî rengî senceqa Meletî bi emanetê ve têtê gire dan û Bêhisnî bo Ebdurehman Paşayê Rîşwanî têtê tewcîhkirin û bo Gerger û Şîro jî mutesellîm têne rêkirin. Paşê Yûsûf Paşa bi xwe jî diçe Meletîyê û xelkê Meletîyê yê di dema Omer Paşa da serê xwe bo emanetê neçemandî têtê tirsandin (Erkutun, 2004, pp. 113-114).

Piştî van bizavên Yûsûf Paşa yên pêkînanana asayîşê û komkirina bacan êdî zêdetir hate pêşçav û vê çendê derê walîtiyên eyaletên cuda bo wî vekir. Eyaleta Dîyarbekir heyamek bû ji walîyekî muqtedîr bê par bû. Sultanî, ji ber hêza binecihkirina otorîteya dewletê ya Yûsûf Paşayî, ew bi payeya wezîrîyê ve wekî walîyê Eyaleta Dîyarbekir wezîfedar kir. Eve yekemîn paye bû ku derveyî Emaneta Me'denan bo wî hatîye raspartin. Li dû agahiyên Zîyanameyê li hemî deverên Eyaleta Dîyarbekir alozî û serkeşi habû. Yûsûf Paşa bi rêka mutesellîmekî eyalet rê ve bir û delîlbaşê xwe Hecî 'Elî Axa bi hêzeke leşkerî ya mezin ve rêkire deverê. Vê hêzê, hukûmetên kurdan yên wekî Hênê, Tercîl, Etax, Ceska, Çepeqçûr û Lîcê ku walîyên berê neşîyabûn bi çi şiklî desteserîyê li ser wan bike, çewisandin û kirin fermanberên dewletê. Bi vegêrana Zîyanameyê Cizîra Botan, Hezzo, Esmered û gund û nahîyeyên ser bi Êzidxane yên ji elsîne-î ûnas we qûyûdat-i atîke-î qirtas ve hatîye zanîn ku ser bi Dîyarbekrê ve ne, bi rêkirina hinek qasidan ve hatine tirsandin û bi pêgirîkirina emrê dewletê ve hatine hişyarkirin (Erkutun, 2004, pp. 114-115).

Derbarê teserûfên îdarî yên derveyî Emaneta Me'denan numûneya herî baş walîtiya Yûsûf Paşa ya li Eyaleta Erzerûmê ye. Dema Kerîmxanê Zend mirî û Qaçarîyan

bizava wergirtina hukmê Îranê kirî, ji ber ku Erzerûm cihekî stratejîk û serhudûd bû hewceyî walîyekî bi hêz çêbû. Ji ber vê çendê Yûsûf Paşa wekî walîyê eyaletê hate wezîfedarkirin. Yûsûf Paşa dema ji Kebanê çûye Erzerûmê emr û ferman bo walîyên Çildir, Wan û Qersê rêkirin û dîyar kir ku ji ber ku walîyên Erzerûmê serkêşên serhedan in divê ew walî hemî pêgirîyê bi emrên wî bikin (Erkutun, 2004, pp. 119-120). Di çarçova meqala me da teserûfên wî yên îdarî ya herî balkêş peywendîyên Yûsûf Paşa û mîrê senceqa Bazîdê Îshaq Paşa ne. Zêde dewlemendbûn û erdnîgarîya berfireh ya jêrdestê Îshaq Paşa, bala Yûsûf Paşa kêşaye û wî xwestîye bi şiklekî Îshaq Paşa ji nav bibet. Li dû nivîseke tehrîtaratên walîyê Erzerûm û yê Wanê ya di sala 1796ê, ji mîremîranan muteserîfê Bazîdê Îshaq Paşa ji ber serweta xwe ya zêde pêgirîyê bi emrên walîyên eyaletê nake, di sînorên eyaleta Wanê da hinek êrîş pêk îrane û zerereke mezin gehandîyê xelkê deverê. Herdû walîyên navborî ji bo cezakirina Îshaq Paşa izin û harîkarîyê dixwazin. Herwesa herdû walîyên navborî bi teqrîrên hinek ulema û ocaqzadeyên deverê ve hinek kes rêkirine Stenbolê. Dema lêpîrsîn ji van kesan hatîye kirin heqîqeta meselê derkeftîye meydanê (HAT.208.11024).

Li dû lêpîrsînê eşkera dibe ku Yûsûf Paşa ji bo rakirina Îshaq Paşa û li şûna wî danana birazayê wî Xelîl Begê pênc şeş hezar leşker rêkirîye li ser Îshaq Paşa û herwesa hêzeke harîkar jî ji walîyê Wanê xwestîye. Ji ber vê çendê Îshaq Paşa jî hêzeke leşkerî rêkirîye ser sînorên Wanê. Di vê navberê da Yûsûf Zîya Paşa penî ve û bêyî xeberê walîyê Wanê di gel Îshaq Paşa pêk hatîye û sulh kirîye. Hêzên Îshaq Paşa, ji nişkê ve êrîş birîne li ser hêzên Wanê û kuştareke zêde daye wan. Di vê êrîşê da xwarzê Mîrê Hekarîyan, Tîmûrpaşazade jî hatîye kuştin. Li ser vê çendê hêzeke giran ya Hekarîyan û Wanê ji bo tolvêkirinê xwe amade kirine û ji bo êrîşê izna sultanî dixwazin (HAT.208.11024). Her çend wekî dîyar rastîya rûdanê bi vî awayî derkeftîye meydanê ku sebebê esasî Yûsûf Zîya Paşa ye. Her çend rastî ji bo Dewleta Osmanî eşkera bûbe jî bi çavê dewletê Îshaq Paşa ji ber ku xudan hêzeke mezin e û peywendîyên wî di gel xanên Îranê hene divê bête rakirin. Lê belê ji ber xaîleya Axa Muhemed Xanê Qaçarî û şertên hudûdên serhedan divê ve gavê li dijî Îshaq Paşa çî bizavên xeternak nehêne kirin. Ji ber vê çendê ji Yûsûf Paşa hatîye xwestin ku bo rakirina Îshaq Paşa heta planeke aqilane peyda neke bila lezê neke û çavê xwe lê bigire (HAT.208.11024).

Dema Yûsûf Zîya Paşa bi hêza leşkerî ve neşîya Îshaq Paşa ji nav bibet vê carê ji bo bertengkirina sînorên deverên jêrdestê wî bizav kir. Bi vê mebestê çend raport bo Stenbolê rêkirine. Di nivîseke xwe ya sala 1797ê da îfade dike ku Îshaq Paşa ji ber ku hêza wî ya malî berkemal e, bi armanca bi şiklekî serbixwe zebt û teserûfa memalîkê Kurdistanê bike, xudanên yurtlûq ocaqliqên derdora xwe bi tohmetên cuda cuda ve suçdar dike û bi vî awayî dest danaye li ser sencaqên Eleşgird, Xinis, Tekman, Melezgir, Xamûr û Dîyadînê. Bi vê çendê ve dewlemendîya wî zêde bûye û serbixwe lê hatîye. Êdî muhafîzên Wan û Qersê ji xwe kêmtir dibîne û heke ji yekî Erzerûm, Qers û Wanê 'aciz bibe bi hêzên 'eşîretên Sibkî û Heyderan ve êrîşê dibe li ser wan. Divê sencaqên wî yek bi yek ji destên wî bêne wergirtin û tenê Xamûr û Dîyadîn, ew jî ji ber ku dahata wan kême, bila bo Îshaq Paşa bene hêlanê. Senceqa Eleşgird bo Xelîl Begê û Melazgir jî bo mîrê Mûşê Mûrad Paşa bêne tewcîhkirin. Herwesa sencaqên Xinis û Tekmanê jî bo Yûsûf Paşa bi xwe bêne tewcîhkirin. Li dû vegêrana Yûsûf Paşa, Îshaq Paşa heta niha bedelê cîzyê nedaye. Belê ji ber ku hêza Mûrad Paşa bi çavê hêza Îshaq Paşa kême, mirov dikare vî bedelî bi sanahî jê tehsîl bike (C.DH.68.3392). Yûsûf Paşa di heman salê da raportek din ji bo

Stenbolê rêkirîye û tê da dîsa behsê dewlemendîya Îshaq Paşa ya ji heddî zêde û pêgirînekirina wî ya bi emrên walîyên deverê kirîye. Li dû îfadeyên Yûsûf Paşa, armanca Îshaq Paşa vegirtin û zebtkirina Kurdistanê ye û ji bo vê çendê dest didane li ser sencaqên derdorê. Yûsûf Paşa dixwaze ku senceqa Eleşgird bo 'Ebdîpaşazade Xelîl Begê, Melazgir bo Mûrad Paşa û Xinis û Tekman jî bo wî bi xwe bêne tewcîhkirin (HAT.63.2753). Wekî ji van numûneyan dîyar dibe terzê rêveberîya Yûsûf Paşa nehêlana desthelatên serbixwe û bi şiklekî sependina hukmê merkezî ye. Di numûneya Îshaq Paşa da reqîbên wî hatine bikarînan û bi rêkirina raportan ve ew li hemberî Dewleta Osmanî wekî sucdar hatîye destnîşan kirin û bo wergirtina deverên jêrdestê wî bizav hatîye kirin.

Li Ser Yûrtlûq Ocaqliqan Sepandina Mûhellefatê:

Di termînolojîya rêveberîya Osmanî da ji bo lêkvekirina mîrata kesê mirî du term dihatin bikarînan: Tereke û mûhellefat. Peyva berê ji bo li dû fiqha Îslamê li warîsan lêkvekirina mîrasa kesê mirî hatîye bikarînan. Lê belê peyva duyê di çarçova biryareke tesorûfa îdarî ya dewletê di me'na musaderê da hatîye bikarînan. Jêderê tereke şerî'et û jêderê mûhellefatê ûrf û tesorûfa îdarî ye. Di terekê da malê kesê mirî li ser warisên wî dihat lêkvekirin û di mûhellefatê da malê kesê mirî beramberî deyn û tekalûfan ji alîyê dewletê ve dihate musaderekirin û wergirtin. Di sîstema îdarî ya Osmanî da mûhellefat wekî dahateke xezîna dewletê hatîye bikarînan. Di sedsala 17an da mûhellefat li ser kesên girêdayî zumreya eskerî ve hatibû sependin. Lê belê di dawîya sedsala 18an û 19an da tetbîqkirina mûhellefatê li ser zumreyên cuda zêde bû. Taybetî dema dewletê nekarîba tekalûfên dewletê bi saxî ji yekî wergire piştî mirina wî bi rêka mûhellefatê deynê dewletê ji mîrata wî werdigirt an jî wekî deyn diavêt li ser piştî warisên wî (Çiftçi, 2022, pp. 320-324) (Özcan, 2005, pp. 405-406). Mûhellefat wekî li jorê di behsa Rîşwanzadeyan da hatîye dîyar kirin ji bo rêveberên dewletê yên deverê hatibûte bikarînan jî ji bo mîrên kurdan ên xudan yûrtlûq ocaqliq û xudan hukûmet nehatîye tetbîqkirin. Lê belê di serdemê walîtî û sedrezamîya Yûsûf Zîya Paşa da sîstema mûhellefatê li ser mîrên kurdan ên xudan yûrtlûq ocaqliq da hatîye cîbecîkirin. Erdal Çiftçi di vekolîneke xwe da bêyî ku îşaretê bide rola Yûsûf Paşa bi berfirehî behsê cîbecîkirina mûhellefatê li ser mîrên Bazîdê û Mûşê dike. Dema mîrê Bazîdê Îshaq Paşa mirî bi şertê dana mûhellefatê mîrgeha wî tewcîhî kurê wî Mehmûd Paşa hatîye kirin. Herwesa dema mirina mîrê Mûşê Mûrad Paşa da jî ev çende li ser kurên wî hatîye tetbîqkirin (Çiftçi, 2022, pp. 328-349). Bi rastî di nûmûneya mîrên kurdan da her çend tenê bedelê mûhellefatê hatibûte wergirtin jî dewletê bi berekî ve du kêl şkandine. Yek ji nakokîyên warisên mîran hatîye îstîfidekirin û kê te'ahûda dana mûhellefatê qebûl kiribe mîratî ji bo wî hatîye tewcîhkirin û bi vî şiklî ji dubendîyên di navbera namzedên mîratîyê sûd hatîye wergirtin. Çunkî heke Mehmûd Paşa bedelê mûhellefata babê xwe nedaba Îbrahîm Begê birayê wî ji bo dana wê amade bû. Bi vî rengî mîrgeh ji alîyê aborî û îdarî ve hatine lawazkirin û seytera dewletê ya li ser wan hatîye bihêzkirin. Ya duyê ji bo xezîna dewletê dahateke nû hatîye peyda kirin. Bi rastî dema mirov li bedelên mûhellefata mîrên kurdan dinêre, mirov dibîne ku ew meblexên hatine danê ji bo wî serdemî meblexên gelek zexm in. Tetbîqa mûhellefatê ya li ser mîrên kurdan di serdemê Yûsûf Zîya Paşa da derkeftîye û derbarê terzê rêveberîya wî û zîhnîyeta wî ya wekî karmendekî dertêxe meydanê. Bi vî awayî hem tekalûfên dewletê bi sanahî hatine komkirin hem jî dubendî û têkçûna abora mîrgehan hatîye çalakkirin.

Bizavên Wî yên Leşkerî:

Cîyawazîya rêveberîya Yûsûf Zîya Paşa taybetî di biwarê leşkerî da dîyar dibe. Rêveberên Emaneta Me'denên Humayûn ên berî paşa, hêzên leşkerî yên taybet xudan nedikirin û heke hewceyî leşkerî biban bi rêka Stenbolê harîkarî ji eyaletên nêzîk dixwestin. Lê Yûsûf Paşa çend heyîvan piştî bûye emînê emanetê hêzeke leşkerî ya taybet ava kir û delîlbaş û tufengçîbaşî danane li ser vê hêzê (Erkutun, 2004, p. 107). Ji bilî vê hêza taybet ji sencaq, qeza û voyvodayên ser bi emanetê ve leşker dihatine komkirin. Mîrên kurdan ên ser bi emanetê ve mecbur bûn harîkarîya wî ya leşkerî bikin. Herwesa hêza emanetê ya leşkerî dema bo şerên di gel Rûsyayê an jî dewletên din dihate şandin yekser girêdayî sereskerîyê dibû. Dema di gel emanetê walîyatîyên eyaletan jî bo Yûsûf Paşa hatîye dane, hîngê jî hem hêza emanetê hem jî hêzên eyaletan bi kar tîna. Hêzên kurdan pişkeke girîng ya hêza leşkerî ya Yûsûf Paşa bû. Ev hêzên kurdan hem dijî kurdan hem jî dijî eşqîya an jî serhildêrên deverên din yên derveyî Kurdistanê hatine bikarînan.

Hêzên emanetê di cara pêşîyê li hemberî kurdên Kûrecikê yên sêgoşa Dîwrîxî, Erxûwan û 'Erebîrê hatine bikarînan. Pênceh kes ji wan hatine kuştin, hinek jî hatine girtin û serên hatine birîn ji bo tirsandina xelkê hatine hilayîstin. Wî bi vî rengî xwestîye ku 'eşîretên kurdan çavtirsîyayî bike. Piştî vê êrîşê leşkerê şande li ser axawatên Xarpêtê, Mewtan Axa kuşt û yên mayî mecbûrî pêgirîya emrên xwe kirin (Erkutun, 2004, pp. 107-109). Yûsûf Paşa ji bo bi rêkûpêk xebitîna me'denan bo rakirina her astengekê gelek bi rijd bû û bo vê çendê her rêyek mubah didît. Numûneya herî baş ji bo vê çendê bi hîlemanê kuştina maqûl û mezinên kurdên Dêrsimê yên Şêx Hesênî ye. Yûsûf Paşa ji roja bûyî emînê me'denan derbarê têkbirina kurdên Çîyayê Dûjek yanî Dêrsimê dihizirî. Ji ber ku wê gavê hêza paşa ya leşkerî têrê nedikir ji bo şkandina Şêx Hesênî hizra hîleyekê kir. Mirovekî xwe yê pêbawer ê bi navê Îsmâil wekî voyvoda di gel sed kesan rêkire qeza Çemîşgezakê. Îsmâil li dû plana paşa danayî çû wê derê û bangeşeyek belav kir. Wî dîyar kir ku êdî ew wekî yên berî xwe deverê rê ve nabet û dixwaze di gel reîs û kedxudayên kurdan bi birayîni bibe serî û dîyarî û xelatên hejî teqdîmî wan bike. Paşê qasid rêkirin nav kurdên Şêx Hesênî û serokên wan vexwendin Çemîşgezakê. Li ser vê çendê sî kes jê serokeşîr û malmezin û heftê, heştê kes jî mirovên wan hatin Çemîşgezakê. Voyvodayê nû li qonaxa xwe ew bi rûgeşî pêşwazî kirin, pirsê halê wan kir û guhdarîya daxwazên wan kir. Dema razanê ew li qonaxên mezinên Çemîşgezakê belav kirin. Paşê emre Yûsûf Paşa nîşa mezinên Çemîşgezakê da û got ku divêt her kes mêvanê xwe bikuje. Mezinên Çemîşgezakê mêvanên xwe hemî kuştin û di navbera du sê sa'etan da sed ser înanê ber qonaxa voyvodayî. Ev ser birin Kebanê û li wê derê hatin hilayîstin û Stenbol ji vê rûdanê hate agahdarkirin (Erkutun, 2004, pp. 109-111). Yûsûf Paşa herwesa hêzên leşkerî şande li ser kurdên Melîkanlû. Ev 'eşîre li devera Şîro ya ser bi senceqa Meletîyê bû. Dema kanên me'denan li çîyayên wan hatin dîtin wan nedixwest ev me'dene bêne derêxistin û otorîteya dewletê nehêt devera wan. Lê bele bi hêza leşkerî ve ew hatin şkandin û çewisandin û paşê me'den hate derêxistin (Erkutun, 2004, pp. 115-116).

Yûsûf Paşa taybetî dema bûye walîyê eyaleta Erzerûmê gelek îstîfade ji hêza leşkerî ya mîr û 'eşîrên kurdan kir. Dema ji ber rewşa Îranê ya aloz wekî walî bo Erzerûmê hatîye wezîfedarkirin, di gel maîyeta xwe ku hezar peyade bûn, leşkerên 'Eşîrên wekî Qereçorlû, Dirîcanlû, Herdî, Zîve û Parçikan û leşkerên mîrê Palû û Çarsencaqê (Pertek, Saqeman, Mazgird û Çemîşgezak) nêzîkî şeş heft hezar leşker birine Erzerûmê (Erkutun, 2004, p. 120). Herwesa leşkerê eyaleta Dîyarbekrê jî xweste Erzerûmê. Dema leşkere

Dîyarbekrê gehîştine Kixiya li ser rêka Erzerûmê li gundekî Ermenîyan ê bi navê Melîkan baregaha xwe danan. Serokeşîrekî ji kurdên Dêrsimê yê bi navê Begzadeoglû Huseyîn ji ber ku dijminahîya wî di gel mîrê Kixi hebû bi xeletî êrîş bire li ser vî leşkerî. Li ser vê çendê Yûsûf Paşa, muteserîfê Micîngirdê bi hêzeke mezin ve şande li ser Begzadeoglû Huseyîn û kuştareke mezin gehande wan. Serên nozdeh kesên hatine kuştin birîn û rêkirine Stenbolê (Erkutun, 2004, p. 121), (C.DH.230.11474).

Yûsûf Zîya Paşa dema li Erzerûmê 1796ê walîtîya eyaleta Çildirê jî bo hatibû tewcîhkirin û bi girtina Şerîf Paşayê walîyê wê yê berê ve hatibû wezîfedarkirin. Bi vê meremê ve bizava amadekirina hêzeke leşkerî ya mezin kir û ji bo vê çendê daxwaza hatina mîrê Bazîdê, Mûşê, Eleşgird, Melazgir û Kixi bo Erzerûmê kir. Mûrat Paşayê mîrê Mûşê bi serkêşîya kurê xwe Mîrza Begê hezar siwarên Rojkî yên bijare, Xelîl Begê mîrê Eleşgirdê bi serkêşîya kedxudayê xwe pênsed siwarên Sibkî, Îshaq Paşa bi serkêşîya zavayê xwe Tîmûr Begê hezar siwarên Silîvî, Îbraîm Begê mîrê Melazgirê bi pênsed leşkerî û mîrê Kixi bi pênsed siwarên Şadîlî ve li Erzerûmê gehîştine paşayî. Piştî ku li Çildir û Ahîsqayê şol êxistin rê di rêka veşerê da li Qersê hêzeke leşkerî ji bo 'Eşîra Keskan hate rêkirin û heftê kes jê hatin kuştin û mal û samanê wan hate talankirin (Erkutun, 2004, pp. 126-127). Bikarînanana leşkerên kurd bi vê çendê ve nemaye û dema walîtîya Yûsûf Paşa ya Trabzonê jî (1797) ji bo têkbirina 'ayanên deverê leşkerên kurd hatine bikarînan (Erkutun, 2004, pp. 133-135).

Sefer û Komkujîya Dêrsimê:

Di nava çalakîyên Yûsûf Zîya Paşa yên leşkerî da ya herî girîng sefera wî ya li ser Dêrsimê ye. Vê sefere ji alîyê berfirehîyê ve em dikarin bişibînin sefera Dêrsimê ya dewra Komara Tirkîyê. Ev sefer yek ji girîngtirîn seferên li ser Dêrsimê ye û mixabin heta niha xebat li ser nehatine kirin. Di Zîyanemayê da ev sefer bi berfirehî hatîye behskirin. Devera Dêrsim wekî Welatê Dûjek û Dersimlû û Şêx Hesênlû wekî du 'eşîrên mezin têne destnîşankirin. Yûsûf Zîya Paşa her ji destpêka emînîyê hizra têkbirina kurdên Dêrsimê û bi yekcarî vegirtina wê deverê kiribû. Serhildana Pasbanoglû ya li devera Balqanan derfeta êrîşeke berfireh bo Yûsûf Paşa çêkir. Pasbanoglu di sala 1797ê li hemberî Dewleta Osmanîyan serî hildabû û devereke berfireh êxistibû jêr destê xwe. Dewleta Osmanî, ji Yûsûf Paşa xwest ku li devera xwe hêzeke mezin amade bike û wekî seresker biçê ve serhildanê têk bibe. Wî jî bi vê meremê hêzeke mezin amade kir. Lê belê Dewleta Osmanî paşayekî din wekî seresker wezîfedar kir. Li ser vê çendê Yûsûf Paşa ji bo ku ew hêza ji bo Pasbanoglû amade kirî li dijî kurdên Dêrsimê bi kar bîne, izin ji sultanî xwest û izin jî bo wî hate danê.

Yûsûf Zîya Paşa di nivîsa xwe ya di Xizîrana 1798ê derbarê pêdivîbûna sefera Dêrsimê da çend egeran rêz dike. Di nivîsê da têtê dîyarkirin ku heke izin bête danê, te'daya taîfa kurdên Şêx Hesênlû, Dêrsimlû û eşqîyayên welatê Dûjek a li ser xelkê derûdorê dê bête rakirin û dûmahî dê li şeqaweta wan bête danê. Wekî li jorê jî hatîye îfadekirin paşa, kurdên derveyî hukmê merkezî an jî naxwazin dewlet tedaxulê karûbarên wan bike, bi îsrar wekî eşqîya pênase dike. Paşa di berdewamîya nivîsa xwe da îşaretê dide wê çendê ku heta niha gelek caran li ser Dêrsimê sefer hatine kirin belê çî serkeftin nehatîye bidestêxistin. Lê di vegêrana wî da wisa têtê îfadekirin ku vê carê çar alîyên Dêrsimê hatine girtin û heke serkeftin bête destêxistin gund û mezrayên di destê kurdên Dêrsimê dê ji wan bêne standin û bi şiklê malîkanê dê tewcîhî erbabê wan bête kirin û bi vî rengî dê bacên dewletê bêne komkirin. Yûsûf Paşa taybetî li ser karîgerîya vê sefere ya

li ser zêdekirina dahata emanetê û me'dena Kebanê radiweste. Li dû gotina wî berî niha gelek caran cab bo me hatîye ku di çîyayên Dêrsimê da kanên me'denan ên mezin hene. Ev çende hem dê faydeyê mezin bide hem jî sexmeratî wan me'denan me'dena Kebanê dê îhya bibe. Herwesa di wextî da li Çarsencaqê salê sî, çil hezar barên komirê dihate neqilkirin. Lê belê ji ber ku daristanên wê deverê ji alîyê kurdên navborî ve hatîye zebtkirin bîst, bîst û pênc sale, sed derd û bela û bi mesrefeke zêde salane tenê şeş hezar barê komirê tête neqilkirin. Ev çende dê bibe sebebê rawestandina me'denê (HAT.63.2753). Wekî ji van îfadeyan dîyar Yûsûf Paşa hem dixwaze otorîteya dewletê li Dêrsimê binecih bike hem jî dixwaze me'denên wê deverê derêxe.

Li dû agahîyên Zîyanameyê Çîyayê Dûjekê yê pir bilind ku welatê Dêrsimlû û Şêx Hesênlû ye gelek çiq û gelîyên wê hene. Ew der devereke berfireh û asê ye û ji bilî kurdan hinek gundên tirk û ermenî jî tê da hene. Kurdên Dêrsimê teserûfê li gund û qezayên derdora xwe dikin û çî bacê nadin dewletê. Mirov dikare bi bîst rojan da derdora welatê Dûjek bizivire û du derbendên çûna Dêrsimê, ji alîyê Çemîşgezakê ve Gelîyê Çemîşgezak û ji alîyê Erzînganê ve Gelîyê Mercanê hene. Di vî welatê asê da otorîteya dewletê hîç nîne û çî nebe eve sed sal e çî karîgerîya walî û rêveberên Osmanî li wê derê çênebûye û çend bizav hatibin kirin jî hemî hewlên dagîrkirina Dêrsimê bê encam mane. Yûsûf Zîya Paşa ji alîyê bawerîya dînî ve jî kurdên Dêrsimê wekî rafizî, mulhîd û munkîr dide nasîn (Erkutun, 2004, pp. 109, 137).

Sefera Dêrsimê di serdemeke wisa da çêbûye ku hemî eyalet û deverên dormandorê Dêrsimê di destê Yûsûf Paşa da bûn. Dema Yûsûf Paşa karên îdarî yên Êrzerûm, Trabzon, Canîk, Gumîşxane û Qerehîsarê êxistîye rê, vegeerî Kebanê û li ser êrîşa Dêrsimê hizirî. Bi dîtina paşa dem ji bo bi yekcarî têkbirina kurdên Dêrsimê û sepandina otorîteya merkezî gelek munasîb e. Çunkî çar alîyên Dêrsimê jêrdestê wî da bû û leşkerê ji bo Paspaoglû hatî diristkirin amade bû. Berê cab ji bo rêvebirên çar alîyên Dêrsimê û yên nêzîkî Kebanê hate hinartin ku di destpêka biharê da sefer li ser Dêrsimê dê bête kirin û divê her kes amadekarîyên xwe bike. Emr hate danê ku ji niha ve hatinûçûna Dêrsimê bête birîn û her kurdê Dêrsimê bête dîtin bê eman bête kuştin. Bi vê meremê bo Welî Paşayê muteserîfê Micîngirdê emir hate rêkirin û jê hate xwestin ku biçe Daxistanê û hezar leşkerê Lezgî bîne. Herwesa ji Mûrad Paşayê mîrê Mûşê hate xwestin ku ew bi xwe digel hêzeke mezin a kurdan amade bibe. Berê yekî bi navê Risemo ê ji eşîra Omerkanlû bi sed û pêncî siwaran ve ji nişka êrîş bîre li ser çend zomên kurdên Dêrsimê. Piştî xulxule keftîye li nav kurdên Dêrsimê Yûsûf Paşa bi xwe ji Kebanê hereket kir. Delîlbaşê paşa, Hacı 'Elî Axa bi hezar û pênc sed siwaran ve pêş keft û di heman gavê da hêzên tufengçîbaşîyê Welî Paşa jî gehîştinê û berê xwe dan Gelîyê Çemîşgezakê. Dema Welî Paşa bi xwe gehîştîye Xarpêtê Mûrad Paşa bi pênc hezar leşkerî ve û herwesa leşkerê Erxenî, Sêwereg, Çermok, Çungûş, Ebû Tahîr, Xerpêt, Meletî, Bêhisnî, Hisn-i Mensûr, Gerger, Şîro, Kahta, Herdî, Zîve, Parçikan, Akçadax, Erxûvan û Aywali kom bûn û berê xwe dane Kebanê. Bi sê keştî û çil kelekan ve di heftîyekê ji ava Feratê derbaz bûn. Berê li gundê Tûrûşme binecih bûn etrafê wê talan kirin. Roja paştir leşkerê Qerehîsar, Canîk û Trabzonê ku nêzî heft heşt hezaran bûn gehîştine wan. Di bin serkêşîya Mûrad Paşa hêzeke mezin cuda bû û êrîş birine li ser mezinê Dêrsimê yê bi navê Mîroglû. Piştî yek du şerên giran Mîroglû şkest û gundê wî Pahê hate girtin. Welî Paşa bi hêza xwe ve Gelîyê Çemîşgezak û derdorên wê girtin. Piştî şerên giran û kuştareke zêde gehîştin deşta Owacîqê. Leşkerê Exîn, 'Erebgir, Septarûz û Pûşadî ji alîyê Exînê ve daxilî Dêrsimê bûn û bi şer ve gehîştine

Owaciqê û Welî Paşa. Ji alîyê din emînê Gumîşxane di gel hêzên xwe û yên 'ayanên Aqşehîrebad û Qerehîsarê û hêzên qezayên Aqşehîr û Sadşehr û voyvodayê Kemah, Gurcanisê Saxirzade û voyvodayê Qûrûçayê ji alîyê bakûrî ve daxilî Dêrsimê bûn. Bi şer û kuştin ve Çemê Kîlabî derbaz bûn û êrîş birine li ser Gelîyê Mercanê. Ji wê derê derbaz bûn û gehîştine hêzên Owaciqê. Herwesa hakimê Kixi Mihemed Beg di gel hêzên Erzerûm, Kixi, Baybûrd, Îspîr, Erzingan û Tercanê ve di gel top û muhimateke mezin ji alîyê Qereçayê daxilî Dêrsimê bûn. Di vê navberê da her çend kurdên Dêrsimê di şeve êrîş îname li ser ordîyê jî şkeste xwar û xwe paş ve kêşan. Mîrê Palû Îshaq Beg bi hêzeke mezin ve ji nahîya Bûlanixê daxilî Dêrsimê bû. Yûsûf Paşa piştî ku hêzên xwe nîvek hêlan baregeha ordîyê, bi xwe heft heşt hezar leşkeran ve çû li ser gundên Hadik û Vanik. Her çend kurdan bergirîyeke baş kiribe jî di dawîyê da şkestin û gelek ji wan hatin kuştin. Kurdên şîyayî xwe ji êrîşan biparêzin bi 'erz û 'eyalê xwe ve ji gundên navborî derbas bûn xwe avêtin gelîyekî çar alîyên wê bi çîyayên bilind ên Dûjekê ve vepêçayî. Lê belê Dêrsim bi carekê hate kavilkirin, rehim bi kesê nehat birin û tevkujîyek li ser hate kirin. Paşa hêzên leşkerî rêkirin her kuncêkî û her kesê hatîye dîtin kuştin, malên wan xerabkirin, terş û talanê wan rakirin. Tenê ew kurdên xwe li gelî da asê kirî zindî man. Paşa xwest ew gelî jî bête girtin û Dêrsim bi yekcarî bête xerabkirin. Lê belê asêbûna hem gelî hem jî dilêrîya kurdên Dêrsimê rê nade vê çendê. Li ser vê çendê biryar hate danê ku hemî rêkên jîyanê lê bêne girtin û di wê zivistanê mehkûmî mirinê bibin. Bi vê meremê bo muhasarakirina herdû derên gelî hezar û pênsed leşker hatine wezîfedarkirin. Herwesa bo cihê manê yê zivistayê yê leşkerî avahî hatin çêkirin û ew avahî tijî zexîre û cebîlxane kirin (Erkutun, 2004, pp. 136-142).

Sefera Dêrsimê li meha Xizîrana 1798ê dest pê kir û heta payîza wê salê dewam kir. Dema Yûsûf Paşa hêj li Dêrsimê berat bo wî hate rêkirin ku wekî sedrazam û sereskerê sefera Misrê hatîye wezîfedarkirin. Li ser vê çendê paşa izna leşkerî da ku vegezin û tenê di serperîştîya leşkerê dê li Dêrsimê bimîne voyvodayê Çarsencaqê Hecî 'Ebdulah Axa hêla wê derê. Wekî ji van agahîyan dîyar paşa, bi hêzeke gelek mezin ve bi armanca bi yekcarî girtina Dêrsimê ve ji her çar alîyan êrîş birîye li ser Dêrsimê. Tevkujîyek dijî xelkê Dêrsimê hatîye kirin û yên mayî ji ber ku paşa ji nişka ve bi sereskerîya sefera Misrê ve hatîye wezîfedarkirin ji nemanê xelas bûne. Heke paşa sefera Dêrsimê nivco nehêlaba îhtîmal e ew kurdên mayî jî dê bihatana kuştin. Herwesa Yûsûf Paşa yekem kes e ku şîyayî Dêrsimê dagîr bike û bo maweyeke kêrî otorîteya dewletê li ser bisepîne.

Sefera Misrê:

Dewleta Frense bi serkêşîya General Napolyon Banoparte di Tîrmeha 1798ê Misir dagîr kir. Sultanê Osmanî Selîmê IIIyê ji bo xelaskirina Misrê li sereskerekî zîrek û şareza digerîya. Yûsûf Zîya Paşa bi çalakîyên xwe yên leşkerî yên serkeftî yên dijî kurdan ve bala sultanî kêşabû û bo vê wezîfê ew hejî hate dîtin. Ev çende di xetê humayûn ê sedrezamîyê da bi eşkerayî dîyar e. Sultan di fermana xwe da dibêje "xusûsan ji ber wê şeca'atê ya te li ser kurdên mulhîdsîrûşt îbraz kirî" me tu hejî vê wezîfê dîtî (Toprak, 2013, p. 728). Çunkî Yûsûf Paşa di wê navberê taybetî bi "te' dîb-î bûxat-i ekrad" û "tenkîl-î tuxat-i bîlad" ve li Stenbolê gelek bi navûdeng bûbû (Toprak, 2013, p. 723). Sebebek dî ya helbijartina Yûsûf Paşa şarezabûna wî ya deverê bû. Di Tebaxa 1798ê Yûsûf Paşa bi payeya sedrazamîyê ve hate teltîfkirin û bo Stenbolê hate xwendin. Dema caba sedrezamîyê bo Yûsûf Paşa hatî ew li Dêrsimê bû. Karê leşkerî yê Dêrsimê ji bo voyvodayê Çarsancaqê hêla û 25î Çirîya Pêşî ya 1798ê gehîşte Stenbolê. Herwesa Nîsana 1799ê wekî

sereskerê ordîya Misrê hate wezîdarkirin û di Xizîrana wê salê ji Stenbolê ber bi Misrê ve rê keft (Sansar, 2019, pp. 37-39) (Erkutun, 2004, p. 182).

Di çarçova meqala me da tiştê bi sefera Misrê ve girêdayî bo me girîng îstîxdamkirina kurdan a di ordîyê da ye. Yûsûf Paşa ji ber ku bi salan li Bakûrê Kurdistanê wekî emîn û walî kar kiribû ji deverên kurdnişîn gelek leşker kom kir û bire sefera Misrê. Delîlbaşên wî yên di Me'dena Kebanê û Erzerûmê serleşkerîya wî dikirin her zû gehiştin Yûsûf Paşa û di gel wî bo Misrê keftin rê. (Erkutun, 2004, p. 202). Yûsûf Paşa dema ji Stenbolê derkeftî emr û ferman bo gelek kes û deveran rêkirin û ji wan xwest ku leşkerî kom bikin û bigehin ordîya wî. Bi vê mebestê ji bo Rîşwanzade Ebdurehman Paşa emir hate rêkirin ku hêzên eşîreta xwe kom bike û ew bi xwe jî bête sefere û herwesa li Meletî, Çermok, Besnî û Erxenî jî leşkeran kom bike (Sansar, 2019, pp. 40-41). Yûsûf Zîya Paşa ji bo leşkerkêşîya kurdan li dijî Napolyon emr û ferman ji bo mîrê Hekarîyan Mistefa Begê, muteserîfê Mûşê Mûrad Paşa, mîrê Eleşgirdê Xelîl Begê û mîrê Çepeççûrê hinartin. Di nivîsê da hatîye dîyarkirin her yek ji wan leşkerekî amade bike û bişînin Şamê da wê derê îlhaqa ordîya humayûn bikin (AE.SSLM.III.376.21442). Em nizanin kanê mîrên navborî leşker şandine an ne. Lê belê heta Yûsûf Paşa gehiştîye Şam û Felestînê leşkerên kurd bere bere îlhaqî ordîyê kirine. Delîlbaşê Yûsûf paşa Hecî Elî Axa, Rîşwanzade Ebdurehman Paşa, ji 'eyanên Mereşê Beyazidzade Qelender Beg, voyvodayê Kemah û Gurcanîsê Saxirzade Tîmûr Beg, ji axawatên Xarpêtê Hecî Îbrahîm Axa û Îshaq Axa û muhafîzê Wanê Tîmûrpaşazade Es'ed Beg bi leşkerên xwe ve daxilî ordîyê bûne (Erkutun, 2004, pp. 232, 263-264, 270), (TS.MA.e. 429/4). Wesa dîyar e kurdên beşdarî sefera Misrê kirî bi vana tenê ve nemane. Li dû agahîyên Yasîn el-Omerî gelek kurdên devera Akrê jî beşdarî sefera Misrê kirine (Reûf, 2012, pp. 408-410). Di nava leşkerê Dîyarbekir, Heleb, Rûha û Bexdayê yên beşdarî di vê seferê da kirî gelek kurd hebûn. Bo numûne sereskerê hêzên Frensî Kleber ji alîyê kurdekî bi navê Mela Silêman ê xelkê Şehbaya Helebê ve hatîye kuştin (Erkutun, 2004, pp. 261-262). Hêzên kurdî yên di bin maîyeta Yûsûf Paşa da beşdarî sefera Misrê bûyî ne tenê li dijî Frensîzan şer kirîne. Dema leşkerên Ernawûd û Yenîçerîyên beşdarî sefere kirî li hemberî Yûsûf Paşa serî hildayî û êrîşî otaxa wî kirî, leşkerên kurd li dora paşa kom bûne û ew ji êrîşan parastine (Erkutun, 2004, pp. 272, 281).

Encam:

Di nîva duyê ya sedsala 18an da çalakkirin û serejinû dîzaynkirina rêveberîya me'denan li Kurdistanê ji alîyê îdarî, sîyasî, civakî û aborî ve karîgerîyeke gelek mezin di gel xwe înye. Taybetî di bin rêveberîya paşayekî wekî Yûsûf Zîya Paşa yê zîrek û çalak da te'sîra wê zêdetir çêbûye. Ji ber ku me'den yek ji girîngtirîn dahata xezîna Dewleta Osmanî bû, dewletê gelek pûte bi vî biwarî daye û Emaneta Me'denan bi îmtîyazên berfireh ve îttîhaz kirîye. Emaneta Me'denan berê ji jêrdestê walîyên eyaletan hatîye derêxistin û di serdemê Yûsûf Paşa da di fîlîyatê da eyalet bi emanetê ve hatine girêdan. Herwesa terzê rêvebirina emanetê li ser rêveberîya eyaletan hatîye sepandin.

Emaneta Me'denan her çend bi 'eslê xwe rêveberîyeke malî jî bît, ji ber şertên me'denên Keban û Erxenî an jî ji ber rewşa Kurdistanê ya taybet, di demeke kurt da renekî cuda wergirtîye û ji alîyê teserûfên îdarî û leşkerî ve rastî guhorînan hatîye. Çunkî ji bo peydakirina kanan, derêxistina cewherî, dabînkirin û neqilkirina sotemenîyê û veguhastina me'denan pêdivî bi ewlekarî û asayîşê hebû. Ev çende jî bivê nevê bi sepandina hukmê merkezî û hêza leşkerî ve mumkîn bû. Ji ber vê çendê Emaneta Me'denan di demeke kurt ji kirasê rêveberîyeke malî derkeft û wekî rêveberîyeke îdarî ya

serbixwe û xudan îmtîyazên berfireh xwe dîzayn kir. Bi vî awayî berî ragehandina Fermana Tenzîmatê bizavên sepandina hukmê merkezî bi destê emanetê ve hate rêvebirin. Sînorên emanetê bû pêgehê sepandina hukmê merkezî û muşîrîyên Sêwas û Dîyarbekrê yên cara pêşîyê bi cîbecîkirina Tenzîmatê ve mujîl bûyî, li ser mîrata emanetê hatin avakirin. Lê belê divê ferqa di navbera polîtîkayên emanetê û muşîrîyan nehête ji bîrkirin. Emaneta Me'denan di serperîştîya Yûsûf Paşa da her çend ji bo sepandina hukmê merkezî bizav kiribe jî berevajî muşîrîyan, taybetî ji bo rakirina mîrgehên kurdî nexebitîye. Bizavên emanetê zêdebarî bi bertengkirina sînorên mîrgehên kurdî û şkandin û biçûkkirina hêza wan ve sînordar maye.

Heke mirov Emaneta Me'denan wekî şerîke û kompanyayekê pênase bike hîngê mirov dikare serperîştê wê jî wekî ceo an jî karsazekî bibîne. Birastî jî ji ber ku Emaneta Me'denan di 'eslê xwe da rêveberîyeke malî bû, mantalîteya Yûsûf Zîya Paşa jî wekî rêveberê şerîkeyekê lê hatîye. Hemî bizavên wî yên rêveberîyê li dû hesaba kar û zererê hatine encamdan. Ev taybetmendîya wî di gelek helwest û kiryarên wî da dîyar dibe. Ne tenê di rêveberîya emanetê herwesa rêveberîya wî ya di eyaletên cuda da jî ev taybetîya wî dîyar e.

Yek ji girîngtirîn nuqtêya ku divê bête dîyarkirin hebûna hêzeke taybet ya leşkerî ya Emaneta Me'denan e. Yûsûf Paşa her ji roja dest bi rêveberîyê kirî hêzeke leşkerî ava kiribû. Ji ber ku Emaneta Me'denan hem ji alîyê aborî hem jî ji alîyê çek û teqemenîyan ve xudan jêderên xurt bû, hêza leşkerî ji bo emanetê nedibû bargiranî. Ev hêz ji bo belavkirina hukmê merkezî, diristkirina asayîş û ewlekariyê û çavtirsandin û çewisandina mîrgeh û 'eşîretên kurdan hatîye bikarînan. Serkeftinên Yûsûf Paşa yên leşkerî girîngtirîn palder in ji bo bernîyabûn û teqdîrkirina wî ya ji alîyê sultan ve. Herwesa çalakîyên wî yên leşkerî dergehê payeyên bilindtir bo wî vekirine. Hêza leşkerî ya Yûsûf Zîya Paşa bi piranî her ji kurdên deverê pêk dihat û wî her hêza kurdan li dijî kurdan bi kar anîye.

Yûsûf Zîya Paşa maweyeke gelek dirêj li Kurdistanê rêveberî kirîye û qenc an xerab peywendî di gel kurdan girê dane. Ew, di rewşa Kurdistanê û sîrûştê kurdan gelek şareza bûye û zanîye kanê dê çawan serederîyê di gel wan bike. Di terzê peywendîyên wî yên di gel kurdan da du helwestên serekî derdikevin pêşberî me: Dilxweşkirin û çavtirsandin. Bi tewcîhkirina senceqbegî, voyvodayî, mûçe an jî bi karên cuda ve dilê hinekan xweş kirîye û ew kêşane alîyê xwe ve. Taybetî li hemberî muteserîfê Mûş û Eleşgird, voyvodayên Çarsencaq, Kixi û yên devera Erzînganê û axawatên Xarpêtê ev polîtîkaye bi kar îname. Li hemberî mîrên Palû, Gêlê, Bayezîdê û Rîşwanzade û 'eşîretên cuda cuda jî politikayên çavtirsandin û çewisandinê bi kar anîye. Di vê polîtîkayê da, xwe ji kuştin û talankirinê nedaye paş û bi hilayîstina serên kuştîyan ve tirs li ser xelkî peyda kirîye.

Di çalakîyên leşkerî yên Yûsûf Zîya Paşa da, Dêrsimê cihekî cuda heye. Hem ji ber nebûna hukmê merkezî li Dêrsimê hem jî ji ber hêza kurdên Dêrsimê ya li deverê, wî tekbirin û girtina Dêrsimê wekî yek ji girîngtirîn armanc danaye li ber xwe. Bo pêkhatina vê çendê gelek fikirîye û her rêyeke wî bigehîne vê armancê bi kar anîye. Bi hêzeke gelek mezin ve ji çar alîyan êrîş biriye li ser Dêrsimê û wê dere komkujîyek mezin kirîye. Belkî di

dewra Osmanî da yekemin paşayê Osmanî yê şîyayî Dêrsimê dagîr bike Yûsûf Zîya Paşa be. Belê xweşbextane ji ber vexwendina wî ya bo Stenbolê ev êrîşe bi diristî sernekeftîye.

Jêder:

a-(BOA) Devlet Arşivleri

AE.SSLM.III. 273.15800 (21.03.1206), (18 Çirîya Paşî 1791)

AE.SSLM.III.376.21442 (29.12.1213), (3 Xizîran 1799)

C.DH.230.11474 (29.07.1210), (8 Sibat 1796)

C.DH.68.3392 - 02.04.1212), (24 Îlon 1797

HAT. 565.27729 (29.12.1226), (14 Kanûna Mezin 1812)

HAT.208.11024 (12.05.1211), (13 Çirîya Paşî 1796)

HAT.63.2753 (16.12.1212), (1 Xizîran 1798)

HAT.63.2753 (17.05.1212), (5 Çirîya Paşî 1797)

TS.MA.e 898.15 (25.12.1223), (11 Sibat 1809)

TS.MA.e. 429.4 (23.4.1215) R. Ahir (13 Îlon 1800)

b-Berhem

Alanağlu, M., 2017. *Osmanlı İdarî Sistemi İçerisinde Palu Hükûmeti*. Doktora Tezi, İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, İstanbul, Türkiye.

Beydilli, K., 2013. Yusûf Ziyâ Paşa, *İslam Ansiklopedisi*. (Cilt.44, pp. 34-36). İstanbul, TDV Yayınları.

Çiftçi, E. 2022. Erken 19. Yüzyılda Yurtluk-Ocaklık Sancaklarının İlgası Girişimleri: Sancak Yöneticisi Muhallefatının Müsaderesi ve Muhallefat Bedeli Uygulaması. *Osmanlı Devleti'nde Yurtluk-Ocaklık ve Hükümet Sancaklar*. Haz. Erdal Çiftçi; Veysel Gürhan; Mehmet Rezan Ekinci. İstanbul, Tarih Vakfı Yurt Yayınları, pp. 319-352.

Erkutun, M. İ., 2004. *Darande'li İzzet Hasan, Ziyânâme*. Doktora Tezi, İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, İstanbul, Türkiye.

Özcan, T., 2020. Muhallefât, *İslam Ansiklopedisi*. (Cilt.30, pp. 405-406). Ankara, TDV Yayınları.

Reûf, Î. E., 2012. *Dîrasat wesaiqîyyetî fî Tarîxî'l-Kurdî'l-Hedîs ve Hedaretîhîm*. Dimeşq: Darû'z-Zeman.

Sansar, N., 2019. *Yusuf Ziya Paşa (Siyasi ve Askeri Faaliyetleri)*. Yüksek Lisans Tezi, Adıyaman Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Adıyaman, Türkiye.

Söylemez, F., 2011. Malatya Mutasarrıfı Rişvanzade Ömer Paşa'nın Muhallefâtı. *OTAM (Ankara Üniversitesi Osmanlı Araştırma ve Uygulama Merkezi Dergisi)* Issue 27, pp. 165-194.

Tızlak, F., 1991. Keban-Ergani Yöresinde Madencilik (1780-1850). Doktora Tezi, Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Elazığ, Türkiye.

Tızlak, F., 2000. Ma'adin-i Hümayun Emanetinin Osmanlı İdari Düzenindeki Yeri (1775-1867). *XII. Türk Tarih Kongresi*. Ankara, Türk Tarih Kurumu Basımevi, pp. 926-941.

Toprak, S. V., 2013. Nuri Tarihi (Metin İnceleme). Doktora Tezi, İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, İstanbul, Türkiye.

Ünal, M. A., XVI. Yüzyılda Mazgird, Pertek ve Sağman Sancakbeylikleri-Pir Hüseyin Bey Oğulları. *OTAM (Ankara Üniversitesi Osmanlı Araştırma ve Uygulama Merkezi Dergisi)*, Issue 2, pp. 239-265.

- ¹ Muqata'a: Di sîstema îdarî û aborî ya Osmanî da bi şertê nefirotinê dana kîraya saman an jî arazîyeke dewletê bo yekî. Ew der wekî milkekî bo maweyeke dîyarkirî dihate danê bo hinek kesan.
- ² Voyvoda: Di sîstema îdarî û malî ya Osmanî da kesê bi komkirina îltîzamên (dahatên dewletê) devereke ve tete wezîfedarkirin. Voyvodatî paşê veguhaste qeymeqamîyê.

In Kurdistan, the development of Tanzimat (Me'den Emini Yusuf Ziya Pasha and the His management style Administration as an Example)

Summary:

In the history of the Ottoman State and the Kurds, the announcement of the Tanzimat Order is a very important period. With this order, although the authority of the sultans has been somewhat reduced, the authority of the central government has been applied to every corner of the state. The Kurdish territories were mostly connected to the state in the form of government and yurtluq, and they had extensive authority in the internal administration. In the framework of the implementation of the central rule, the Kurdish principalities were removed one by one and their territories were managed, all aspects fell under the control of the central administration. However, the process of implementing the central rule was not done systematically and at once. The Kurdish princes came out against this and as a result of heavy wars and conflicts, this process came to an end. The efforts of the Ottoman State to implement the centralized rule is a background of some political, administrative, economic and social changes. Even before the announcement of the Regulation Order, the efforts regarding the application of the central rule have started in some form. Especially during the period of Yusuf Ziya Pasha (d. 1817) who was the manager of the Humayun Mines Trust, which was one of the most important financial sources of the Ottoman State, the application of central rule and reduction of the authority of the Kurdish princes was started in the North of Kurdistan. Yusuf Pasha, in addition to the administration of the Me'denan Trust for a long time, also served as the governor in the states of Ottoman Kurdistan divided into Diyarbakir, Erzerum, Aleppo and Baghdad, and for a long time, he was very knowledgeable about the condition of the Kurds. Yusuf Pasha's efforts regarding the implementation of the central rule of Kurdistan attracted the attention of the sultan and he was appreciated and honored with the salaries of the centurion and chieftaincy. In this article, it is detailed about Yusuf Ziya Pasha's efforts regarding the application of central rule in Kurdistan at the end of the 18th century and the beginning of the 19th century. and the results of his policies leading to the implementation of the Sanazimat, should not be stopped. The purpose of the article is to present a general picture of the North of Kurdistan or the north of the Euphrates in the context of Yusuf Ziya Pasha's administration, before the Tanzimat Order.

Key words: *Yusuf Ziya Pasha, Humayun's Treasure, Tanzimat, Kurdish Heritage, Central Government*